Sazûmana Cîhanî ya Kurd

**Bangewazî**

**Çima konferansa Cîhanî ya Kurd?**

**Vîzyon: Em kî ne û çi dixwazîn?**

Em yek ji yekemîn îradeyên sivîl li diyasporayê ne u baweriya me bi serweriya rêkxistinên sivîl heye û wisa difikrin ku: Kurdan heya îro pişta xwe bi hêza req (hardpower) ve girêdaye ku çendîn caran rastî şikestinê hatine. Îro dema wê yekê hatiye ku Kurd li kêleka hêza req, li hêza nerim (softpower) jî bifikrin. Armanca avakirina hêza nerim li diyasporayê, serxistina civaka sivîle.

Em wisa dihizirin ku: Partiyên Kurdî yekîtiya neteweyî cîbecî nekirine, ji ber wê yekê tenê îrada sivîl dikare yekîtiya neteweyî bidest bixe. Her wisa em di wê baweriyê dane ku rola partiyên siyasî ji rola civaka sivîl cuda ye. Ne partiyên siyasî dikarin cîyê civaka şaristanî dagir bikin û ne jî rêkxistinên civakî dikarin cîyê partiyên siyasî bigirin. Ji ber wê yekê îrada sivîl dikare wek hêza nerim li diyasporayê guhertinên mezin çê bike.

Em wek bawermendên îrada sivîl wisa dibînin ku: Jinên Kurd wek hêzek nediyar ya civaka Kurd, rêjeya beşdarbûna wan di biryarên stratejîk de nêzîkî sifre, her wisa rêjeya beşdarbûna jinan di rêveberiya siyasî de di kêmtirîn ast de ye. Ev tê wateya bêpar bûn û neçalakiya zêdetir ji nîviya civaka Kurdî. Em di wê baweriyê de ne ku di vê serdemê de li diyasporayê wek navenda siyaseta nerim, dema çalakbûna jinan hatiye. Hêza jin bi piştevaniya nifşên nû dikare bibe dînamîzma rêkxistina civaka sivîl li diyasporayê.

**Doza Kurd dozek cîhanî ye:**

Doza Kurd hem neteweyî û hem cîhaniye. Ji ber ku hemû hêzên herêmî û cîhanî astengan jêre çêdikin. Bi van sedemên li xwarê hatine destnîşan kirin, doza Kurdistan, doza Rojhilata Navîn û cîhanê ye jî:

**Yekem** – Di asta jeopolîtîk de pirsa Kurd pirsa çar dewletên Rojhilata Navîn û dehan dewletên tirk, ereb, şî`e, sunne û hêzên herêmî û cîhaniye. Ji bo mînak di giştpirsiya serxwebûna Herêma Kurdistanê de, piraniya hêzên herêmî û cîhanî li dijî vê giştpirsiyê derketin.

**Duyem** – Îro diyasporaya Kurdî li hemû cîhanê belav bûye. Nêzkî pênc mîlyon Kurd li diyasporaya dûr û zêdetir ji heşt mîlyon Kurd jî li diyasporaya nêzîk li Rojhilata Navîn dijîn. Ev yekem care di dîrokê de, Kurdan bi vê hejmarê li seranserê cîhanê belav dibin.

**Sêyem** - Eger doza Kurd dozek cîhanî be, divê bi mekanîzmên cîhanî jî bê çareser kirin. Ji bo vê yekê jî jin wek dînamîzma diyasporaya Kurdî xwedî rolek girîngin. Pêdiviye jin bi alîkariya nifşên nû û ronakbîrên Kurd diyasporaya Kurdî ji nû ve ava bikin û di heman dem de lobîsazî berfirehtir bikin.

**Armancên stratejîk**

Jimara diyasporaya Kurd li welatên cîhanê pênc mîlyon kes derbaz kiriye. Li welatên Yekîtiya Ewrûpa sê mîlyon Kurdistanî dijîn. Eger êrîş û komkujiyên li dijî Kurdan berdewam bin, dibe ku li van pênc salên bê de ev jimar li Ewrûpa bigehe çar mîlyon kesan. Diyasporaya Kurd parçe - parçe, nerêkxistî û bê stratejiye. Pêdiviye ev sermaya mirovî bi rêka van stratejiyan bê çalakkirin:

- Pêdiviye diyasporaya Kurdistanî bi şêwazên sivîl û di çarçova stratejiya avakirina hêza nerim de bê çalakkirin. Her wisa pêwîste xwedî peyamek cîhanî be.
- Pêwîste saziyên neteweyî yên diyasporaya Kurdî bêne avakirin. Diyasporaya Kurdî dikare bi bikaranîna şêwazên sivîl û her wisa bi stratejiya hêza nerim yekîtiya neteweyî bidest bixe.
- Divê diyasporaya Kurdistanî armanca serxwebûnê vejîne. Eger li navxwe li Kurdistanê ev armanc rû bi rûyî astengên mezin dibe, diyasporaya Kurd dikare alaya serxwebûne bilind bike.

**Bingeh û struktur**

Armanc û stratejiyên diysporaya Kurd, bi van amrazan tê bi dest xistin:

- Konferansa Cîhanî ya Kurd, saziyek neteweyî ya diyasporayê ye ku wê wek parlementoya derveyî welat bixebite. Konferansa Cîhanî ya Kurd, civînek salane ye ku wê bi mebesta diyarkirina armanc, stratejî û siyaseta diyasporaya Kurdî bi rêve biçe û wê konfederasyon, federasyon, navend, dezgeh, komele, enstîtu û endamên hilbijartî têde bi civin. Jinan wek hêza pêşeng wê di damezrandinê de rola xwe bilîzin.
- Sazûmana Cîhanî ya Kurd, baskê çalak yê diyasporaya Kurd e û wê beşa sereke ji biryar û taktîkên Konferansa Cîhanî ya Kurd encam bide. Sazûmana Cîhanî ya Kurd, rêkxistina sereke

ye ku wê şiyanên diyasporaya Kurdî ji hizir veguhêze praktîkê. Pêdiviye jin li hemû welatên cîhanê sazûmana cîhanî ya Kurd damezrînin.

**Diruşim: Hêlên sor**

Ev prensîpên hanê, me û her kesên kû bawerî pê hene, li jêr heman sîvanê de kom dikin:

- Xebata diyaspora xebatek sivîle, ne hukumî u ne hizbiye û hêzên cûrbicûr nikarin hegemoniya xwe bi ser de zal bikin.

- Xebata diyaspora xebatek neteweyî – Kurdistaniye û bi tu şêwazek çemkên navçeyî, zaraveyî, parçeyî, dînî û hizbî nayên qebûl kirin.

- Bawerî bi hêma û sîmbolên neteweyî: Serxwebûna Kurdistanê, sirûda neteweyî û ala neteweyî hêlên meyî sor in. Nexşeya Kurdistanê û serxwebûna Kurdistanê li cem me nayên gengeşe kirin.

**Diruşmên me yên sereke ev in:**

1- Tenê îrada sivîl yekîtiya neteweyî bidest dixe.
2- Doza Kurd dozek cîhaniye.

**Gavên kirdarî:**

Komîteya amadekar ku di heman dem de desteya damezrênere jî, ji aliyê Sazûmana Cîhanî ya Kurd tê diyarkirin ku wê karûbarên yekemîn Konferansa Cîhanî ya Kurd encam bide.

**Erkên komîteya amadekar ev in:**

- Damezrandina Sazûmana Cîhanî ya Kurd li wan welatên ku diyasporaya Kurdî lê heye.

- Pêkanîna federasyona komeleyên Kurdî di wan welatan de ku komeleyên Kurdî bi hejmara pêwîst têde hene.

- Li dar xistina yekemîn konferansa jinên Kurd ji bo amadesaziya Konferansa Cîhanî ya Kurd.

- Amadekarî ji bo li dar xistina konferansa ciwan u nifşên nû û konferansa karsazên Kurd bi armanca piştgirî kirina projeya Konferansa Cîhanî ya Kurd.

**Silav û rêz**

**Komîteya amadekarî**